Bidestveanîna Mafên Netewî
Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal De

Hejmar: 170
6'ê Çiriya Paşîn 2011
Buha: 150 Tûmen

# Agirî

Peyama pîrozbahiya Sekreterê giştî ê PDKÎ seba hatina Cejna Qurbanê

Ez hatina Eyda Qurbanê ji tewaya hemwelatiyan bi taybetî xûşk û birayên me li Kurdistana Îranê pîroz dikim.
Hêvîdar im ku hemû rojên jiyana we pirr ji cejn û şahî û keyfxweşî bin.
PDKÎ
Sekreterê giştî/ Mistefa Hicrî
14. 08.1390
05.11. 2011

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

**Kongireya Amerîkayê** tehrîmên nû bi ser Îranê de sepandin

R: 2

Wezîrê Derve ê Behrênê:
**Îran dixwaze Şîeyên** cîhanê girêdayî Wilayeta Feqîh bike

R: 6

**PDK Îranê di daxuyaniyekê** de hevxemiya xwe bi gelê bakûr re nîşan da

R: 2

## Êhod Barak:
# Her roj em bi êrîşa ser Îranê nêzîktir dibin



**H**eyamek e ku êrîşa ser Îranê bûye rojeva medyayan. Her di vî warî de rojnameya Gardiyan nivîsandiye ku Birîtanya xwe ji bo êrîşa bo ser Îranê amade dike, û renge DYA' daxwaza alîkariyê ji Brîtanyayê bona mifahwergirtin ji binkeya "**Diyego Garsya**"a wî welatî di zeryaya Hindê bo êrîşa ser Îranê bike û di vê êrîşê de muşekên "Tam Hawk" bikar bîne.

Di civîna G 20'ê de jî Obama, Sarkozî û Deyvîd Kamiron pêdagirî kirin ku wê li hemberî programa navikî ya Îranê de zextên xwe zêdetir bikin. Herweha Sarkozî ragehand ku em li hemberî êrîşa bo ser Îsraîlê bêdeng namînin. Her di vê derbarê de Uhod Barak li gotûbêja bi BBC'ê re ragehandiye ku em roj bo rojê bi êrîşa bo ser Îranê nêzîk dibin, jiber ku her roj Îran bi çêkirina bombeya navikî nêzîktir dibe û metirsiyên ser ewlehiya me jî zêdetir dibin.

Wezîrê Derve ê rejîma Îranê jî, 3'ê Novemberê li Lîbiyê de helwesta welatê xwe nîan da û da zanîn ku: Em li rewşa herî xirap de jî amade ne ku li hember her êrîşek leşkerî bo ser Îranê de bisekinin.

## Rejîma Îranê bi navê Azeriyan bêhurmetiyê bi Kurdan dike

**Rejîma Îslamî a Îranê li Zanistgeha Tehranê, kovareke Farsî bi navê "Weten yolî" wate rêbaza niştiman çap û bilav kiriye û têde ji aliyê Azeriyan ve bêhurmetî bi neteweya kurd kiriye.**

Kovara han ku ji aliyê îdara Ferheng a Zanistgehê ve tê bilavkirin, heya niha çand caran ji aliyê Azeriyan ve hatiye mehkumkirin. Hêjayî basê ye ku tu Azerî di birêveberiya vê kovarê de cih nagrin, û ew kovar ji aliyê besîciyên zanistgehê ve tê birêvebirin.




## Rejîma Îranê ji aliyê Komîteya mafê mirov a NY ve hat mehkûm kirin



Komîteya mafên mirov a NY, roja Pêncşemî, 3'ê Çiriya Paşîn, Komara Îslamî bi teqîba sîstematîk a neyarên siyasî, kêmaniyên mesebî û ... tometbar kir. Komîteya han dide zanîn ku îşkence, îdam û kevirbaran bûne tiştên asayî li Komara Îslamî a Îranê de.

Wê komîtê serbarê rexne kirina rejîmê li warê pêpeskirina mafên mirov de, daxwaz ji rejîmê kir ku pabendî soz û peymanên xwe li dor rêzgirtin ji mafên mirovan be.



**Meclîsa** 9'ê û rojeva Xameneyî

Ebdulla Hicab

Komara Îslamî pilan dike ku di dema pêşiya me de Meclîsa xwe bi kesên...

R: 3



**Medalyaya terorîzmê û** şanaziya rehîngirtinê

Selîm Zencîrî

Şoreşa ku gelên Îranê li sala 1979'an de bi îrade û comerdiya xwe biser xistin û...

R: 6



**Para Kurdan** pîsbûna jîngehê ye

Ceifer Mubeşirniya

Berpirsên hikûmetî ên Komara Îslamî tim îdia dikin ku xelkê Îranê di refahê de dijîn û carna ... R: 8



Aynûr Doxan
R: 10

hevpeyvîn: Letîf Epozdemir

www.arsivakurdi.org

Hejmar 170, 6'ê Çiriya Paşîn 2011

# Peyama hevxemî û hevderdiya PDK Îranê bi boneya erdheja Wanê

Roja Yekşemî, 23'ê Çiriya Pêşîn a 2011'an, erdhejek bi pîvana 7.2 rîşter, li devera "Wan"ê li Kurdistana Turkiyê rû da û li gor zanyariyan, beşek zaf a deverê ve girtiyeve û heta bajarên Urmiye û Duhok jî hejandiye.
Li gor zanyariyên ku heya niha bilav bûne, erdheja han wêraniyek zaf li vê deverê pêk aniye û bi sedan kes kuştî û birîndar lê bi cih mane û mixabin egera zêdebûna goriyan hêj heye.



PDK Îranê bi boneya vê karesatê, hevxemiya xwe li gel xelkê Turkiyê bi giştî û xûşk û birayên xwe ên Kurd li Kurdistana Turkiyê bi taybetî nîşan dide. Sersaxiyê dide malbatên goriyan û hêviya her ciqas zûtir başbûna birîndarên vê karesatê dixwaze. Herweha daxwaz dike ku hemû xelkê Kurd û saziyên mirovî û hevkarîder bi hewara xelkê belengaz de herin û hevkariyên pêwîs bigîjînin wan.

**PDK Îran**
**24.10.2011**
**02.08.1390**

## Sergotar

### Siyasî kirina tirajîdiyek xwezayî

**Selîm Zencîrî**

Dîmenên erdhej û tirajîdiya mirovî a bajarê Wan û Ercîş a Kurdistana Turkiyê ku bû sedema kuştin û birîndar bûna 5000 kesan û wêran bûna mal û halên bi hezaran kesên din li vê sirr û seqemê de, wijdana mirovahiyê hejand û carek din êş û azar, tazî û xembarî xiste nav mala kurdan. Her çend birînên vê karesatê gelek kûr û bi jan in, lê hin rastiyên veşartî raxistin berçawan.

Li rastî de tenê surûşt nebû ku birîn xiste ser cismê kurdan, belkî rasîszm û şovenîzma hinek turkan jî birîn xiste ser kezeb û hesta kurdan. Wan keysê xwe bi ser kurdan de anî û bi girnijîn û keyfxweşî ve ragihandin ku "ev felaketa xwedê heq û para kurdane"; Yan eva ku li cihê alîkariyan û parve kirina êş û azaran, kewir, alên Turkiyê û nivîsokên bi heqaret ji wan re şandin.

Ji hêla din ve jî siyasî kirina vê karesatê ji aliyê hikûmetê ve serbarê wê ku rûyê rastîn ê wê eşkere kir, tarîtî xiste ser hêvî û baweriya kurdan bi desthilata Enqerê û hikûmeteke ku hawara musilmantî û dadperweriyê diqîrîne û durûşma çareser kirina pirsa kurd dide. Wey ji vê edalet û musulmantiyê!!

Eva ku Serok wezîr û hin berpirsiyarên pêwendîdar bilez xwe gihandin deverên erdhej lêdayî, (her çend ku niha derdikewe rûyekî bû) tiştek erênî û baş bû; Lê eva ku li destpêkê de bi awayek hişk û nasyonalîstane alîkariyên derekî ret kirin, helwestek şaş û tam siyasî bû. Bi awayek din hest û demarên şovenîstane û perwerdeya faşîstane ku konê xwe li hişê hin ji wan de vedaye, rê neda ku alîkariyên derve bo kurdan bipejirînin. Bixwe jî çunku bi xurtî tevnegeriyan û organîzasiyon û pilanek rêk û pêk, micid û bilez li dor gihandina alîkariyan û bi hawarde çûna lêqewmayiyan nemeşandin, asta goriyan zêdetir û derbên ruhî û rewanî ên wê jî berçawtir kirin.

Çend rojan piştî karesatê, li jêr zextên navxweyî de îzna hevkariyên derekî dan, û me dît ku ji her alî ve alîkariyên mirovdostane bo xelkê Wan û Ercîşê hatin şandin; Lê evar li parvekirina kon û alîkariyan de xwe gêzirandin û xemsarî kirin û dikin. Hawar, daxwazî û gazindeyên lêqewmayî, dilşikestî, hest birîndar, kezeb şevitî û malwêranbûyên erdhejê û dîmenên jiyana xembar a wan a li bin sirr û berf û baranan de selmênerê vê rastiyê ye.


Ji hêla din ve jî li cihê wê ku hikûmet bikewe tedbîrên bilez û erkê mirovî û nîştimanî ê xwe bicî bîne, tenê seetek jî navber neda erdhejê û operasiyonên girtin û binçavkirina sivîl, endam û hilbijêrên BDP'yî li hundur û reşandina napalm û çekên kîmyayî bi ser sînorên herêma Kurdistanê û gerîlayên PKK'ê de berdewam kirin û heya niha jî didomînin. Operasiyonên ku bi salan e bona helandina Kurdan didomin.

Lê divê êdî bizanin ku gelê me yê kurd ne bi erdhej, ne bi şovenîzm û faşîzma tirkan, ne bi girtin û binçavkirinan, ne jî bi kuştin û operasiyonan naqede û wê her li ser bîratî, bihevrejiyan, berxwedan û xebata siyasî û aştiyane a xwe berdewam be.

## Amerîka, Îsraîl û Birîtanya xwe ji bo êrîşa bi ser Îranê amade dikin

**Li gorî nûçeya rojnameya Gardiyan, di navbera vê yek sala lê pêşiya me de, renge Amerîka ji rêya esmanî û bejahî ve êrîşê bike ser damezrawên navikî ên Îranê.**

Pêka wê çavkaniyê Birîtanya jî li ser vê bawerê ye ku hekî êrîşek weha pêk were, divêt piştevaniya Amerîkayê bike. Li gorî vê çavkaniyê her çend ku Amerîkayê hêz û şiyana vê hindê heye ku bi tenê êrîşî ser Îranê bike, lê Birîtanya jî dixwaze ku di vî warî de alîkariya wan bike.



## Kongireya Amerîkayê tehrîmên nû bi ser Îranê de sepandin

**Komîteya têkiliyên derekî ên kongireya Amerîkayê bona pêşigirtina ji programa navikî a Îranê tehrîmên nû bi dijî binyatên malî, neftî, û etomiya vî welate pesend kirin.**

Li gorî wan tehrîman, yên ku niha pêde bi pîşesaziya neft, û gaza Îranê re li pêwendiyan de bin, ji wergirtina vîzaya Amerîkayê wê bêpar bin.




Her di vê derheqê de berpirsiyareke Komîteya Têkilyên Derekî a Kongireya Amerîkayê ragehand ku "Tehrîmên nû dikarin dîhariyek pirr baş ji rejîma Îranê re bin bi boneya bidawîhatina sala 2011'an.
Li gorî wan tehrîman, kes yan nawendên derekî ku piştavaniya Sipaha Pasdaran dikin jî bikevin ber tehrîmê, û herweha bankên cîhanî jî hekî bi banka Nawendî a Îranê re têkilyan pêk bînin wê bikevin ber tehrîman.

Pisporeke karûbarên bankdarî û tehrîmên navnetewî ên Amerîkayê, di warê bandora tehrîmên han li ser vê bawerê ye ku tehrîma Banka Nawendî dibe sedema vê ku buhayê diravê Îranê li hember diravên din de dakewe. Herweha dê bibe sedema vê ku xelkê Îranê neçar bin li dinûsitandinên rojane de dolar yan yoro bikar bînin.

## Xemsarî li hember hişkbûna gola Urmiyê berdewam e

**Nûnerê Urmiyê di parlementoy a Îranê de bi tundî desteya Serokatiya Parlementoyê seba giringînrnedana bi hişik bûna gola Urmiyê rexne kir.**

Nadir Qazîpûr, nûnerê Urmiyê di parlementoyê de serbarê rexne kirina Desteya serokatiya parlementoyê ragehand ku wan gelaleyek derheq pêşîgirtina ji hişikbûna gola Urmiyê amade kiriye.

Li gorî zanyariyan serokê parlementoya Îranê Elî Larîcanî di bersiva pêşniyara Qazîpûr de got ku di civînekê de ku berpirsyarên pêwendîdar beşdar bûne biryarên giring hatine dan û hewcehî bi tu gelaleyek din nake.

Larîcanî herweha ragehand ku biryar hatiye dan ku di navbera sê salan de çi qas pere bona pêşîgirtina ji hişikbûna gola Urmiyê were mezaxtin.

## Daliqandin, zarokan ber bi tundûtîjiyê ve dibe

**Birêvebirina hukmê daliqandinê di cihên giştê de, zarokan hînî tundûtujiyê dike û mirin û kuştinê bal wan asayî dike.**

Behmen Kişawerz, Serokê Binyata Parêzerên Nawendê di vî warî de got ku tenê bas ji kevirbarankirinê di cihên giştî de hatiya kirin, lê serbarê birêvebirina wan hukmên giran dîsan jî ji rêjeya tawanan kêm nebûye. Daliqandin û îdamên han di ber çavên giştî de bûye sebeb ku, zarokek 7 salî li bajerê Ehwazê bi Kêrê zarokeke din ê 8 salî b navê Emîr bikuje.

www.arsivakurdi.org

# Meclîsa 9'ê û rojeva Xamineyî





Ebdulla Hicab

Komara Îslamî pilan dike ku di dema pêşiya me de Meclîsa xwe bi kesên nû tije bike û weke caran dubare basî hilbijartina parlemanê dike. Di bingeha xwe de pêvajoyek bi navê "hilbijartin" di Komara Îslamî de tu mana nîne u manovrên ku bi navê hilbijartinan tên dayîn, piranî ji bo sergirêdana xelkê û xapandinê ne. Lê her çawan be, dema bas ji hilbijartinan tê kirin, rojeva siyasî, her nebe di çarçoveya sîstemê de germe.

Hilbijartina gera 9'ya Meclîsa Îranê ku rêjîm ji niha ve amadekariyan jê re dike, ji ber ku yekem hilbijartina piştî arîşeya navbera Mûsewî û Ehmedînijad e, hinek zêdetir ji hilbijartinên pêşîn balkêşe. Û ji wê yekê jî giringtir, ji ber ku di demekê de ev hilbijartin birêve diçe ku di nava rêjîmê de gelek aliyên rikeber li hember hev serî hildidin û her yek ji wan bi rojeva xwe dikeve hilbijartinê, dûr nîne ku dema pêşiya me ji bo qedera Komara Îslamî jî xwedî giringî be.

Di nava sîstemê bi xwe de rêzbendiya grûpên rikeber hê bi tewawî ne zelale û ya rast beşdarên tevnpîrka deselata Komara Îslamî bi xwe jî nizanin ka kî bi kî re ye û kî li hember kîjanê din e. Ya ku ji niha ve xuya dike ewe ku bigir- bikêşa navbera rikeberên di nava sîstema siyasiye Îranê de ji aliyekê û didan kûrisandin û çavzil kirinên Xameniyî ji aliyê din ve wê "hilbijartinê" bikin sehneya manovrên Xameniyî ji bo cîgir kirina beşek nû ji pilana xwe ya deselatdariya mutleq. Lewma jî tê payîn ku gelek kom û grûpên ku ji rabûn û rûniştinên dîktatoraneye Xameneyî nerazî ne, wê nekaribin beşdarî pêvajoya hilbijartinan bibin.

Serokê dezgeha hilbijartina gera 9 ya mecilsa Îranê Sowlet Murtezewî ji niha ve gotiye ku wê rê nedin komel û girûpên ku alîgiriya Mûsewî û Kerûbî dikin bikevin pêvajoya hilbijartinê. Bi wî rengî her sê partiyên «Cebhêyê Muşariketê Îranê Îslamî», «Nêhzetê Azadî yê Îran» û «Sazmanê Mucahidînê Înqilabê Îslamî» ji hilbijartina gera tê ya parlemanê têne bêpar kirin. Hêceta rêjîmê ji bo pêşî girtina wan ewe ku îzna têkoşîna wan sê rêkxistinan hatiye betal kirin. Ji xwe ji bilî wan rêkxistinan hemû partî, komel û girûpên ku alîgirê guhertinanin her ji destpêka jiyana wê rejîmê ve hatibûn qedexe kirin.

Rêzbendiyên nava rêjîmê ku xwe ji bo pêşbirkêya li himberanî hev, lê hemû di yek çarçoveyê de amade dikin, ya ku heya niha eşkere di 3 grûpan de xwe nîşan didin. Her nebe ew 3 grûp di nava sîstemê de xwedî bandorin her çend ku her yek ji wan cuda ji ya din rojeva xwe dimeşîne. Ew sê rêzbendî pêk tên ji: Parêzvanên binajo (Muhafizekarên tundrev), Popolîstên teknokrat û Sipahê Pasdaran bi dûvik û baskên xwe yên ewlekariyê û çekdar ve.

Di demekê de ku her du grûpên pêşîn ji bo pêşve birina armancên xwe yên siyasî kêm û zêde bi eşkere li hember hev dixebitin, hêzên Sipaha Pasdaran û grûpên girêdayî wan bi dizî û li jêr ve, bêy ku xwe weke hêza sêyemîn a siyasî nîşan bidin kar dikin. Lê bi kiryar Sipahê Pasdaran berjewendiya xwe bi rêkxistinên muhafizekare tundrev re ku girêdayî Xamineyî ne dibîne û ji bo ku ciyê xwe hê bi hêztir bike bi wan re dixebite.

Di eniya yekemîn de, ya ku kivş e, her du melayên serhişk û tundrew; Mehdewî Kenî û Misbahê Yezdî cî digrin ku carna bi hev re û carna jî cuda cuda hewl didin ku hevbîrên xwe yên binajo bînin bin yek sîvanê û bi wî awayî eniyek hevgirtî li hember grûppen derveyî xwe danên.

Popolîstên ku piraniya wan bi îmkanatên Sipahê li derveyî welat an jî li zankoyên Îranê xwendina bilind tewaw kirine û bi alîkariya Sipah û çeteyên Besîc ketine nava dezgehên birêveberiyê, îro li derdora Ehmedînijad kom bûne. Ew niha xwe ji Sipah û Besîc bê minet dihesibînin û bi piştgiriya projeyên popolîstiye dewletê weke projeya alîkariya diravînî an «yarane» hewl didin ku bingehek cemawerî di nava civakê de bi dest bixin. Ew grûp dixwazin dewletek xurt ji teknokratên oldar ava bikin ku ji deselata olîgaşiya melayan re sînûrekê danê, lê bingeh û çarçoveya deselata dînî biparêze.

Beşek din ji hêviya derûdorên popolîste ku xwe bi Ehmedînijad ve girê dane ewe ku nasyonaklîzma Îranî û binajoiya oliye şîe bi hev re bikin yek û bi wî awayî rola Îranê di siyaseta cîhanê de zêde bikin. Li gor wan ew dema ku her 3 faktorên dîrokî, olî û kultûrî bi hev re bibin yek, wê Îran weke hêzeke xwedî bandor, ciyek giring di siyaseta cîhanê de bigre. Bi wê mebestê ye ku hin mohreyên wê eniyê dixwazin xwe weke bîrokratên jîr û hişmend ji cîhanê re bidin nasandin ku dixwazin rêbaza siyaseta derveye Îranê biguherin û Îranê ji riya dijminkariya bi Rojava paşve bizivirînin. Rehîm Meşayî navê herî xuyaye wê komê ye. Lê gelek nîşane hene ku ew alî hem bi pirsgirêka bêbaweriya xelkê û hem jî bi zext û givaşên aliyên Muhafizekar re rûbirû ye û wê zehmet bikare xweserî xwe karekê pêşve bibe. Xamineyî heya demek beriya niha wisan nîşan dida ku dixwaze parsenga navbera hemû grûpan bi awayek yeksan diparêze, lê di wê dema dawî de bi awayek zelal dixebite ku pêşiya popolîstên teknokrat bigre. Rawestana wî li hember hin biryarên Ehmedînijad di derbarê cî bi cî kirina wezîran, destavêtina di çarçoveya siyaseta derve, mijara sînûrdar kirina deselata abûriye Sipahê Pasdaran û hwd nîşan dan ku êdî Xamineyî ji Ehmedînijad û zêdegaviyên wî têr bûye.

Di pêvajoya hilbijartina gera 9. a Meclîsa Îranê de jî Xamineyî rojeva xwe heye. Ev dixwaze hem deselat û meydana karê popolîstên hevpeymanê Ehmedînijad berteng bike û hem ji bo pêşerojê wan kesan bîne nava parlemanê ku ji bo pilana wî kar bikin. Bi wê riyê ve Xameneyî dê bikare her nebe bi rûkeş meşrûiyetê bide pêvajoya xurt kirina deselata mutleq ya Weliyê Feqîh ku tê payîn ji niha û pê ve pitir tev li karê birêveberiyê bibe. Her ji ber wê hindê ye ku niha basa ji nav rakirina posta serokkomar aniye rojevê û dixwaze bi riya parlemanê deselata birêveberiyê bi awayek hê zêde sîstematîk bi xwe ve girê bide.

Sipahê Pasdaran jî rojeva xwe dimeşîne. Sipah îro li Îranê hem weke hêza çekdar, hem weke hêza ewlekariyê, hem weke deselatek îdeolojîk û hem jî weke hêzek abûrî kar dike. Xameneyî ji bo pêşve birina pilanên xwe hemû giraniya xwe daye ser xurttir kirina Sipahê û rê daye ku Sipah weke dewletek di nava dewletê de bi xwe biryar bide, birêve bibe, siyasetê bike û li hember kes an tu dezgehên dewletê de jî xwe berpirsyar nezane.

Fermandarên Sipahê ji siyaseta navxwe ya Îranê bi der, di siyaseta herêma Rojhilata Navîn û siyaseta Navneteweyî de jî niha xwe xwedî gotin dihesibînin û dixwazni ji bandora olî û îdeolojîk zêdetir, bi hêza xwe ya rêxistinî û çekdarî berjewendiyên navneteweiye rêjîmê biparêzin.

Her çend rojeva her yek ji wan 3 aliyên ku xwe ji hilbijartinan re amade dikin ji hev dûr be, lê xala hevbeşe her 3 aliyan ewe ku di çarçoveya dîktatoriya Wilayetê Feqîh de dixwazin sîstemê ber bi yekdestbûnê ve bibin. Yekdestiya nava sîstemê jî tê manaya zexta zêdetir bo ser gelên welat, xurtbûna bingeha dîktatoriya olî, bêmafiya zêdetire xelkê û arîşe û aloziyên zêdetir li herêmê.



www.arsivakurdi.org

# Şoreşger dîlên şer nakujin

Rûken

Piştî kuştina Qezafî, derhêner û lîstikvanên navxweyî û derekî ên sînaryoya azadiya Lîbiyê seba vê ku rolekî pirr giring li hiloşandina dîktatoriyeta Qezafî de lîstin, bi keyfxweşiyek zaf ve pîrozbahî ji hevdu kirin, û temaşevanên vê sînaryoyê jî her yek ji wan li gorî dîtingeha xwe bi coşek bê hempa ve daketin nava kolanên şerlêdayî ên Lîbiyê, lê hinek ji wan jî seba şêweya kuştina Qezafî û berçavnegirtina mafên mirovî ên dîleke şer, ne tenê ji hêrsa wan ji Qezafî kêm bû, belkî tirsa hatine ser kar ya dîktatoriyek din kete dilê wan de.

Şêweya kuştina Qezafî û kurê wî nîşan da ku leşkeriyên li jêr fermendehiya Şêvra Întiqalî de, li kar û kiryarek hevaheng û bernamedarêtî de biryar dane ku hekî Qezafî bikeve destê wan, nehêlin zindî bimîne. Jiber ku Qezafî pêwendiyek nêzîk bi rojavayiyan re hebû, û gellek ji rêberên niha ên Şêvra Întiqalî jî alîkarê Qezafî bûn, û heke bihatiba dadgehîkirin, wê gellek nihênî eşkere kiriban ku bi zirara rojavayiyan û rêberên niha ên Şêvra Întiqalî ban.

Di rastî de şêweya reftara xelkê Lîbiyayê di gel Qezafî, ne wek reftara xelkekî di rastî de şoreşvan bi dîlê şer re bû, û diviya mafê kesê bi dîl girtî bihatiba parastin, û navbirî li gorî yasayên navnetewî bihatiba dadgehîkirin. Lê cuda ji şêweya kuştina wî, bi nimayîş danîna termê bêcan ê Qezafî li pêşberî xelkê (her çend li gor gotina berpirsyaran li Şêvra Întiqalî de bona xatirce bûna xelkê ji kuştina Qezafî bû), kar û kiryarek dûr ji exlaq û însaniyetê bû.

Mixabin di welatekê de ku ji şaristaniyet û pêşkevtinê bi cî maye, riftarên bi vî awayî heta bi dîlên şer re jî, wek serkevtin yan şanaziyek pirr mezin tê hesibandin. Şêweya kuştina Qezafî ew qas dijî însanî bû ku di rastî de ji coş û heyecana azadîxwazan seba hiloşîna dîktatoriya Qezafî kêm kir û hêviya cihgirbûna asayiş û ewlehiyê jî di hikûmeta piştî Qezafî de kêm kir, ji ber ku ew xelkê ku mafê dîlê şer neparastin, bê guman li ser deshilatê jî renge bi vî awayî ne şaristanî reftarê bikin.



Di ratsî de xelkê asayî stûna her şoreşekê ne, û seba vê ku xelkê asyaî ji destê dîktatoran êş û azara herî zêde dibînin, lewra her tim bîr ji tolhildanê dikin û di wan deman de yasayên navnetewî nas nakin û dest bo kar û kiryarên weha dibin, lê hewlnedana hêzên Nato bo pêşîgirtina ji kuştina Qezafî gumanên li ser hebûna biryarek yekdest li ser kuştina wî çend qat zêde kir.

Lîbyayiyan ew derfet hebûn îsbat bikin ku pêşeroja welatê wan li ser bingeha edaletê wê bê avakirin, nek tundutujiyê, û dikarîn bi dadgehîkirina Qezafî biselimînin ku cînayetkar her çend xwedîhêz bin jî, lê li hemberî edalet û îradeya xelkê zulmlêkirî de wê rojekê bi çok de bên.

Kuştina Qezafî ew qas hovane bû ku dijkiryara hinek welatan li pey xwe anî. Wezîrê Karûbarê Derve ê Rûsiyê ragehand ku bi kuştina Qezafî Konvansiyona Jinêvê hatiye binpêkirin, jiber ku dîlê şer nabe bê kuştin. Navbirî ragehand ku divêt em rêz ji yasayên navnetewî re bigrin.

Saziya Efûya navnetewî jî bi derkirina daxuyaniyekê ragehad: Serbarê wê ku deshilatdariya Qezafî bi dawî hat, lê divêt tawanbarên serdemê Qeafî bêne dadgehîkirin, herweha vê saziyê daxwaz ji Şêvra Netewî a Demkî ya Lîbiyê kir ku derheq şêweya kuştina Qezafî lêkolînan bikin. Herweha daxwaz kir ku divêt çanda tundûtûjiya serdemê Qezafî bi yekcarî jinav bibin.

Li dijkiryara bi nûçeya kuştina Qezafî re Nawî Pîlay, komîsera payebilind a mafê mirovan a NY daxwazkarê encamdayîna lêkolînên tewaw di vî warî de kir, û got ku dîmenên bilavbûyî nîşan didin ku rêberê pêşîn ê Lîbiyê piştî girtinê hatiye kuştin.

Piştî kuştina Qezafî em dikarin bêjin ku herçend heya niha civatgeha cîhanî ketiye jêr bandora teknokiratên wek Mustefa Ebdulcebîl, û serokê Şêvra Demkî ya Lîbiyê Mehmûd Cebreîl, lê pêkhateya eşîretî û hebûna Îslamgerayên wek Ebdulhekîm Bilhac, fermanaderê nizamî ê Trablosê û tundrewên Şêvra Leşkeriya Mêsratê û Binxazî, nebûna dewlet-neteweya modern, û nebûna yekîtiyekê li ser pêkhatina deshilatdariyek demokratîk di Lîbiyê de, mirov nikare bi tu pêşerojek geş û bê şer hêvîdar be, û bê guman cihgirbûna demokrasiyê demek dirêj û nirxek giran dixwaze, ku em hêvîdar in xelkê Lîbiyê bigîjne wê rojê.

# Rapora Ehmed Şehîd bê kêmasî nebû



Şehab Xalidî

Her piştî diyarîkirina Dr. Ehmed Şehîd wek nûçegihanê taybetî ê mafê mirovan bo Îranê li 17'ê Juena sala 2011'an de karbidestên rejîma Îranê ragehandin ku ew rê nadne Ehmed Şehîd ku bête Îranê û ji nêzîk ve çavdêriya bi ser rewşa mafê mirov de biket, jiber ku diyarîkirina raportnêrekê bo Îranê ne pirsek hiqûqî, belkî gellek armancên siyasî li piştê ne.

Helwestek herçend çavnihêrkirî a bi vî awayî serbarê vê ku nîgeraniyek zaf di nav kom û civînên navnetewî de lê ket, lê weha xuya ye bibe sedem ku komeleyên navnetewî û Civata Mafê miovan ya NY gellek micidtir ji berê li ser rewşa mafê mirovan di Îranê de kar bikin, jiber ku diyarîkirina raportnêrek taybetî bi mafê mirovan bo Îranê bixwe nîşaneya xirapiya zaf ya rewşa mafê mirovan di vî welatî de bû, û biryarek bi vî awayî heya niha tanê ji bo welatên wek Miyanmar, Kamboc, Felestîn, Brondî, Somalî, Haîtî, Lîbirya, Sûdan û Kureya Bakûr hatiye dan.

Dr. Ehmed Şehîd roja 15'ê Oktoberê di demekê de rapora xwe amade kir ku rejîma Îranê ji hemû demekê zêdetir ketiye tengasiyê de, û civatgeha navnetewî jî pêdagirtir ji caran, li hemberî binpêkariyên mafê mirovan di welatên ku dîktator bi ser de hakim in, helwestan digre.

Lewra ew neteweyên ku berdewam mafê wan ê mirovî tê



binpêkirin, bi hestyariyek zêdetir ve raporek bi vî awayî dinirxînin, û helwesta xwe ya dawiyê derbarê vê raporê de eşkere dikin.

Em Kurd jî li ser vê bawerê ne ku xalek pozetîv ya vê raporê ew e ku serbarê vê ku Dr. Ehmed Şehîd rê pê nehate dan ku sefera Îranê bike, û ji nêzîk ve rapora xwe amade bike, lê rapora wî bê alî hatiye amadekirin, û bi awayek durust bas ji beşek zaf ya wan binpêkariyên mafê mirovan kiriye, lê di hemen dem de rapora wî bê kêmasî jî nine. Hekî navbirî bi hûrî bas ji wan binpêkariyên berçav ên mafê mirovan di Kurdistanê de wek: girtin û îşkencekirina çalakên siyasî û ferhengî, ên Kurd îdamkirina wan li jêr navê qaçaxçiyên madeyên bê hişker, kuştina kasibkaran li ser sînoran, û hilnegirtina wan mayînên (mînên) ku li serdemê şerê Îran û Îraqê de bi cih mane, û gellek caran dibe sedema bûyerên dilêş ên wek qetbûna dest û piyên kasibkaran û heta kuştina wan jî, û gellek binpêkariyên din ên mafê mirovan kiriba, bê guman dikarî giraniya rapora wî zêdetir bike.

Amadekirina raporek rast û durust ku îşare bi tewaya wan binpêkariyan bike ku ji aliyê rejîma Îranê ve li ser neteweyên jêr dest birêve diçe, cuda ji vê ku erkek exlaqî ye, dikare civatgeha navnetewî û parêzerên mafê mirovan jî bi hişyariyek zêdetir ve li hember binpêkarên mafê mirovan li hev bicivîne ku bê guman ew hevgirtin, dikare rejîmê ji her demekê pitir li warê desthilgirtina ji tepeserî û kuşt û kuştara xelkê welatê me bixîne tengasiyê de.

Agirî 5
Hejmar 170, 6'ê Çiriya Paşîn 2011

# Îraq bi vekişîna hêzên Amerîkayê aloztir dibe!



Dara Natiq

Piştî gengeşe û diyalogek zaf di navbera aliyên siyasî ên Îraqê de û serbarê hebûna bîr û hizrên cuda derheq hewcehiya man yan nemana hêzên Amrîkayê di wî welatî de, di encam de biryar hat dayîn ku diviya dewlata Amerîkayê pabend bi wê peyaman û sitratejiya be ku di navbera herdu welatan de hatiye wajo kirin û li dema diyarîkirî û bêy rawestan, tev hêzên xwe di wî welatî de vekişîne û rêz ji serweriya axa Îraqê bigre.

Ew biryara hikûmeta Îraqê di demekê de ye ku hin aliyên siyasî, nemaze Kurd û Erebên Sunî yên li ser vê bawerê ne ku bi berçav girtina zirûfa siyasî, tenahî, civakî û abûrî a Îraqê, vekişîna hêzên Amerîkayê yê derbek mezin ji tenahiya welêt bide û ew yêk dê bibe sedema neewlehî û aloztirbûna welêt û egera wê çendê heye ku şerekî qewmî di wî welatî de biqewim e.

Her li dîv vê biryara dewleta Îraqê, Serkomarê Amerîkayê Barak Obama bi awayek fermî ragehand ku Amerîka pabend e bi wan biryarên xwe yên stratejîk tevî Îraqê û ew rêzê ji serweriya xaka wî welatî digrin û dê tev hêzên xwe heya dawiya sala 2011'an, ji Îraqê vekişîn in û tenê hejmarek kêm ji wan hêzan bo parastina balyozxaneyên xwe li wî welatî dê bimînin.

Bêşik, biryara vekişîna hêzên Amerîka bûye cihê nigeraniya hin aliyên siyasî yên Îraqê. Ji aliyek din ve jî dewleta Îranê keyfxweşiya xwe ji vê biryarê ragehand û ew yek jî bûye hegera nîgeraniya zêdetira hinek hêz û aliyên siyasî.

Gendeliya îdarî, nebûna tenahiyê, hebûna girûpên terorîstî, alozî û pevçûnên navbera hêz û aliyên siyasî, şerê tayifî û olî, pawanxwaziya hêz û aliyên siyasî, destêwerdana welatên cîran nemaze hikûmeta Îslamî a Îranê, çaresernekirina dehan biryar û raspardeyên siyasî û yasayî yên welêt weke madeya 140 û... ji wan arîşe û girêpêçkan in ku dibe hikûmeta nawendî a Îraqa Federal piştî nemana hêzên Amerîkayê bi wan arîşeyan re berengar be. Tewahiya wan arîşane paşeroja wî welatî ber bi qederek aloz û nediyar ve dibin.

Ya ji hemûyan girîngtir, ew e ku bi nemana hêzên Amerîkayê, hikûmeta Îslamî a Îranê bi awayek eşkere û rasterast destêwerdana di nav kar û barên îdarî û birêveberiya wî welatî de dike û dixwaze deshelatek tekrew û yekdest a Şîe bo dijberî kirina tevî Kurd û Erebên Sune bîne serkar û bi vî awayî pêgeha xwe di Îraqê de bihêz bike û Îraqê bike qada rikeberî û cilîdanêya xwe bi dijî Rojava û Amerîkayê û pêşvebirina armancên biyom û şerxwazane yên xwe.

Ji aliyekî din ve car din hêz û girûpên binajoxwaz û terorîst bi hebûna valahiya han, liv û bizavên xwe ji bo sepandina armancên hovane yên xwe ber bi zêdebûne ve dibin û ew welat wê car din bibe qada girûpên terorîstî. Ji aliyekî din ve milmilanêya di anvbera Erebên Sunî û Şîe li ser bidestvegirtina deshilatê û bihêzkirina pêgeha xwe û pirsgirêka herî mezin û berçav e ku egera wê hindê heye Îraqê ber bi şerekî tayifî ve bibe.

Lê bêşik ji tev aliyekî re rohn û eyan e ku dewleta Îraqê ne ew hêza leşkerî û esmanî a xwedîhêz bo berengarbûna bi wan dewlet û girûpên terorîstî re heye, û ne jî pekhateya siyasî a wî welatî xwediyê wê hêz û îradeya yekgirtî û teba ye ku bikare bi berçavgirtina berjewendiyên welêt bi giştî û dûr ji berjewendiyên hizbî û hizra pawanxwazî berengarê wan arîşe û girêpêçkên piştî nemana hêzên Amerîkayê di vî welatî de be.

Lê serbarê wan rastiyên ku me li serî de bas jê kir, Amerîka bi vê hêsaniyê dest ji Îraqê bernade û derfet û valahiya han bo girûpên terorîstî û nemaze welatên weke Îranê nahêle. Amerîkayê bi sedan milyard Dolar di hiloşandin û jinavbirina rejîma dîkatator a Sedam Husên û avakirina wî welatî de serf kirye. Herwusan bi hizaran serbazên Amerîkî di wî welatî de bûne qurbanî û buhayek zaf li darêtina sitratêjiyek dirêjheyam di wî welatî de daye. Lewma wê hêsanî dest ji Îraqê bernade ku hikûmetên dîktator ên weke Îranê, Îraqê bikine qada pêşvebirina siyasetên qirêj û biyom ên xwe.

Di çend rojên borî de wezîrê Derwe yê Amerîkayê ragehand ku hikûmeta Îslamî a Îranê dibe bizanin gava em hêzên xwe ji Îraqê vekişînin, dê bi awayek din çavdêriyê bi ser wî welatî de bikin û derfeta vê yekê bi tu hêz û aliyên siyasî nadin ku Îraqê bikin goriyê berjewendiyên xwe.

Biryar e ku Amerîka hêzên xwe yên li Îraqê li welatên weke Qeter, Kowêyt, Behrêyn û Kendawa Fars de cihgîr bike û bi wê yekê nifûza Amerîkayê li herêmê de zêde dibe û bi vê rêkê ve dikare tev liv û bizavên Îranê li Îraqê û welatên din de bixe bin çavdêriya xwe û çavdêriyê bi ser kar û barên Îraqê de bike.



## Amerîka û Sipaha Pasdaran bi hevre civiyan

**Nûnerên Supaha Pasdaran a rejîma Îranê û nûnerên Amerîkayê di yek ji welatên Ewrûpayî de li ser aloziyên di Sûriyê de li hev civiyan e.**

Rojnameya Lofîgaro a Feransî ragihand ku di daviya meha Agost û destpêka meha Septamberê de nûnerên Supaha Pasdaran a rejîma Îranê û nûnerên Amerîkayê li ser alozî û kêşeyên di welatê Sûriyê de li hev civiyane û bas ji pêkanîna Şêvra Bilind a leşkerî li Sûriyê de kirine, da ku piştî jinavçona rejîma Beşar Esed fermandeyên leşkirî berpirsatiya karûbarên stratijîk ên welat bigrine dest xwe.



Li gorî çavkaniyan, di nava Sipaha Pasdaran a Komara Îslamî de seba qeyrana Sûriyê dubendî û nakokî pêk hatiye, jiber ku beşek ji sipaha Pasdaran alavên leşkerî bo serkuta zêdetir didin hêzên ewlehiya Sûriyê, lê beşek din serkuta xelkê Sûriyê bi tundî rexne dikin.

## Aloziyên di navbera rejîma Tehran, Riyaz û Waşintonê zêde dibin

**Arîşeyên derbarê pîlana terora balyozê Erebistanê, di navbera Îran , Amerîka û Erebistanê de, zêdetir dibin, û Welîehdê Erebistanê jî dibêje em bi Îranê re gotûbêj û lihevhatinan pêk naînin.**

Li gorî nûçeyan, Amerîkayê di nameyekê de ku ji dewleta Îranê re şandiye, daxwaz ji rêberên Komara Îslamî kiriye ku hekî rêberên Îranê haydarî pîlana terora balyozê Erebistanê ne, bila berpirsatiya wê bigirin stûyê xwe, û hekî haydar nebin jî, bila du tawanbarên terorê radestî Amerîkayê bikin.

Komara Îslamî jî ji rêya balyozxaneya Siwîsê li Tehranê ku parêzerê berjewendiyên Amerîkayê ye, bersiva xwe di heft rûpelan de, amade kir û ji wan re şand ku li gorî gotina berdevkê Wezareta Derve ya Amerîkayê ew bersiv gellek tund û pirr ji înkar bûye.

www.arsivakurdi.org

# Medalyaya terorîzmê û şanaziya rehîngirtinê



Selîm Zencîrî

Şoreşa ku gelên Îranê li sala 1979'an de bi îrade û comerdiya xwe biser xistin û azadiya ku dara wê bi xwîna xwe avadan kirin, hinde pê neçû ku ji aliyê rejîma îdeolojîk û bîrteng a Komara Îslamî ve hat talan kirin. Rejîmek ku xwe bi nûnerê xwedê li ser erdî dizane û banga ji holêrakirina zulm û zorê û bicih kirina dadperweriyê diqîrîne, bi xwe bûye çavkaniya bêedaletî û şandina hovêtiyê. Rejîmek ku desthilat bi tewahî qorix û li pêxema bihêz kirina xîmên wê de xwe ji tu metod û rêkarên dijî mirovî û hov neparastiye û naparêze jî.

Paşan rejîmê sepandina hêz û hejmoniya xwe li du astên navxweyî û derveyî de kire armanca desthilata nerewa a xwe. Ku me dît ji tirsa vegerîna dubare a seltenet xwazan û ji dest dana desthilata mirar a xwe, dest avête kiryarên tund û tûj, dijî mirovî û kuştarên bikom. Lewma di bin tomet û navên cur bi cur de pêvajoya bizdandina xelkê, serkut, kuştin û îdama alîgirên rejîma berê, fetisandina dengên nerazî û xwedî rayên cuda xiste warê piratîkê. Di vê çarçoveyê de bi hezaran kes gullebaran, bi hezaran îdam û bi sedan hezar kes jî riya mişextî û derbideriyê da pêşiya wan ku ew koçrew niha xwe li milyonan kesan dide. Dûre dest bi çandina tovê dubendî û netifaqiyê kir, fitwaya cîhadê li dijî kurdan der kir û ...hwd.

Li asta derveyî de jî şandina şoreşê kire durûşm û bingeha siyaseta xwe. Li pêvajoya bi serxistina vê armancê de jî, mifah standin ji her taktîk, metod û alavekê bi rewa û meşrû dizanî.

Dema ku rejîm êdî ji xwe mikûr hat û hinekê ji xwe xatircem bû, êrîş bire ser balyozxaneya Amerîka li Tehranê û hemû karmendên wê bo midehê 444 rojan bi rehîn girtin. Bi vî awayî yekem gava pêpes kirina yasa û pirensîpên navnetewî û dîplomatîk avêt û xîmê dujminatiya xwe bi Amerîkayê re raçand. Wê kiryarê derbek giran ji hitbara navnetewî a rejîmê û dîplomasiya wê xist û pêlek ji mehkûmiyet û şermezariyan jêre li pey xwe re anî ku PDK îran jî weke yekem hêza Îranî di nava refa wan de bû.


Hikûmeta nûgiha ku êdî sermestê desthilata xwe ya nerewa û serkeftinên li jinav birina neyarên hundurîn ên xwe de bû, hevdem bera şemendefira serkut, bizdandin û terora xwe da derve û bi sedan kes ji çalakên siyasî, çandî û civakî teror kirin ku di nava wan de kesatî, siyasetvan û navdarên weke Şapûr Bextiyar, Daryûş Firûher, Dr. Qasimlo, Dr. Sadiq Şerefkendî û...hwd hene. Bi taybetî dosyaya Mîkonosê wate terora sekretrê PDK Îranê, Dr. Sadiq Şerefkendî mehkûmiyetek navnetewî bo Komara Îslamî li pey xwe re anî û xalek reş xiste ser eniya karbidestên payebilind ên wê.

Hevdem li gel pêşve birina siyaseta terorîstî a xwe de, weke hêcan şerek giran bi ser îraqê de sepand û hezîne û zirarên pir mezin daye destê xelkê Îranê, lê piştî 8 salan neçar ma ku her bi xwe cama jehrê vexwe û rêketina aştiyê wajo bike, şerek ku niha jî şûnwarên malwêranker ên însanî û aboriyên wê her dixuyin.

Li vê navberê de teror û hovêtiya rejîmê tenê pêsîra cudabîr û opozîsyona Îranê nedigirt, belkî li dehan êrîş û kiryarên terorîstî de armancên rojavayî û bi taybet Amerîkî bi nîşange girt ku dewsa wê li her hemiyan de bi başî xuya û eyan e, weke: Teqandina balyozxaneya Amerîka li Lubnanê di sala 1983' an de, teqandina balyozxaneya Amerîka li Kuwêtê di sala 1983'an de, teqandina balyozxaneya Îsraîlê li Arjantînê di sala 1992 an de, teqandina nawenda ayînî a Cihûyan (Amya) li Arjantînê di sala 1994'an de û ... hwd. Xincî vana, berdewam bûye li rehîn girtina şaromendên Ewropayî û Amerîkayî bi tometên sîxorî û ... hwd û paşan jî li danûstanên siyasî de mifah jê standiye; ku sê çiyagerên Amerîkayî jî mînaka zindî a wê ye.

Dawîn hewlidayîna terorîstî jî ku li çend rojên derbasbûyî de eşkere bû û niha rojeva siyasî a cîhanê dagirtiye, pilana teror kirina balyozê Erebistanê û teqandina balyozxaneyên Erebistan û Îsraîlê li Amerîkayê de bû, her çiqas ku bi xweşî ve hate pûç kirin û serî negirt, lê çi ji rolê nerênî û metirsiya ku Komara Îslamî weke gef bo ser tenahiya navnetewî heye kêm nekir. Lewma me dît ku li vê derheqê de him helwestek micid ji bal Amerîka û hevalbendên wê ve hat girtin û him jî dosyaya pilanê radestî Civata Ewlekar a NY hat kirin û renge hezîne û nirxek giran bo rejîmê hebe. Li rastî de ew pilan doma zincîre pilan û kiryarên terorîstî tê ku ji sê dehsalan berî niha ve li dijî armanc û berjewendiyên rojava û bi taybet Amerîkayê dest pê kiriye.

Eva ku niha em dibînin bi çi awayî destêwerdana li nav kar û barên navxweye welatan de dike, ji riya hevkarî kirina bi gurûpên îslamî ên tundajo re çawan hewla neewle û aloz kirina wan dide, belge û dukementên eşkerebûyî li nexş û rola têkderane a rejîmê li Îraq, Efxanistan, Lubnan, Erebistan, Yemen, Behrên û ...hwd jî selmênerê vê rastiyê ne.




Bi giştî, rejîm terorîzmê weke çekek bihêz û metodek rewa bona pêşve birina armancên îdeolojîkî û stratejîkî ên xwe dizane ku durûşma ji holê rakirina Îsraîlê jî li ser xerîteya coxrafiyayî a cîhanê hêcet û pasaweke bo rewatîdan bi wan karan. Em dibînin ku li jêr tarîtiya siyaseta rejîmê de heya niha çiqas tehrîm û dorpêçên aborî û siyasî bi ser Îranê de hatine sepandin û her ku diçe bazneya wan givaşan jî tengtir dibe û roj li pey rojê zêdetir ji civaka cîhanî tê dûr xistin û îzole kirin.

Niha ku şoreşa erebî û şikestina şûşeya temenê dîktatoran dest pê kiriye û ji hêla din ve jî rejîm him li navxweyî welat de rewatiya xwe ji bal gel ji dest daye, him jî li nav eniyên desthilatdar bi xwe de jî dijberî û dubendî gihaye astek bilind, zext û givaşên navnetewî jî li dor pêpes kirina mafê mirov, bernameya navikî û xurt kirina tehrîman bûne sedem ku rejîm, desthilata xwe li lêjiyê de bibîne û her ew tirs jî bibe alîkar bona wê ku hovatiya xwe du hember bike û bixwaze bi gef, neewlehî û teroran bo midehek din siya biyom a xwe bi ser gelên Îranê de garantî bike. Lewma ev pilan jî pêka naverok û pêşîneya rejîmê, tu gumanekê naxîne ser rastiya wê û ewqas eşkere ye ku hewcehî bi tu belgeyan nake. Çunku kes nikare şanaziya makeya terorîzmê û medalyaya çalaktirîn piştevanê terorîzmê jê bistîne, nav û dengiyek ku tenê li bejna wê tê û li pêşbirkêya terorê de kesê şiyana bazdana wê tune.

# "Îran dixwaze hemû Şîeyên cîhanê girêdayî wilayeta Feqîhê bike"

**Wezîrê karûbarê Derve yê Behrêynê, Komara Îslamî bi destêwerdan di nav rewşa navxweyî a Behrêynê, û hewildan ji bo rakêşana tewaya Şîeyên cîhanê bo aliyê Wilayete Feqîh tawanbar kir.**

Wezîrê karûbarê Derve yê



Behrêynê herweha got: rejîma Îranê Behrêynê wek deriyê çûne jor bo Kendavê dihesibîne, û daxwaz ji welatên Erebî kir ku li hemberî wan destêwerdanên Îranê de piştevaniya wan bikin.

şirovekarekî Kowêtî bi navê Eyad Elmina'i di vê derheqê de got ku Komara Îslamî ji rêya darêtina gelaleya terora balyozê Erebistanê li Waşintonê, û pêkanîna toreke sîxoriyê li Kuwêtê û herweha destêwerdana resterast di Behrêynê de, di nava karûbarên Behrêynê û welatên Erebî de destêwerdan kiriye.

# Xamineyî: "Xumeynî dijberên nizamê îdam dikirin, lê ez wan zîndanî dikim!!"

**Di bersiva rexneya Ayetullah Musewî Erdebîlî, Merceê Teqlîd li Qumê derbarê îdama girtiyan de,rêberê rejîmê Elî Xamineyî şanazî bi hindê kir ku wek serdemê rêberiya Xumênî girtiyan îdam nake, belkî tenê wan dixe girtîgehê de.**

Li gorî nûçeyan çend mehan piştî hilbijartinên serkomariyê di sala 1388'an de, dema ku Musewiyê Erdebîlî di hevdîtina xwe bi Xamineyî re, daxwaza serbest berdana girtiyên siyasî kiribû, lê di bersivê de Xamineyî gotibû, dema ku ez Serkomar û tu Serokê Şêvra Bilind a Qezayî ya Îranê bûyî, Xomeynî biryara îdamkirina dijberên Komara Îslamî dida, lê niha min biryara îdamê nedaye û bi tenê biryara destbiserkirina xelkê nerazî daye, lê hêj hûn nerazî ne?

Di serdemê Serkomariya Mihemed Xatemî de jî, meşên nerazîbûnê li zanîngehên Tehranê de birêve çûn, ku ji aliyên hêzên ewlehiyê ve hatin serkutkirin. wê demê jî Xamineyî di bersiva kesên ku rexne ji serkuta xwendekaran ji aliyê Hêzên Ewlekariyê ve girtin got: " Xumeynî dema xwe biryara îdama neraziya da, lê min bi tenê biryara serkuta xwenîşanderan daye, gelo hêj hûn nerazîne?".

# Rejîma Îranê li pey bidestve anîna çeka navikî ye

Di demekê de ku bûyerên di Lîbî, Tûnis, Mîsir, Sûriye û welatên ku ketine ber pêlên Buhara Erebî, cîhan bixwe ve mijûl kirine, Îran jî bi micidî ve mijûlî pirçekkirina xwe ye.

Hikûmeta Îranê li jêr sîbera Buhara Ereb de zêdetir ji demên berê dixwaze ku xelkê xwe serkut bike. Lê di hemen dem de dixwaze bi dîtina têkçûna deshilata kesên herî xwedîhêz ên wekî Mubarek ku hate girtin û Qezafî ku hate kuştin, hewlê dide daku çeka navikî bi dest bixe.

Bi rehetî mirov dikare bigîje vê encamê ku heke Qezafî çeka navikî heba, Nato'yê bi vî awayî destêwerdan li Lîbiyê de nedikir. Serhildêran jî li Lîbiyê de nedikarîn ku bi vî awayî Qezafî ji nav bibin. Li Sûriyê binêrin ku Esed bi sedema destnewerdan nekirina hêzên derekî çawan xelkê serhildêr tepeser dike. Îran jî bi hestyariyek zêdetir ve rewşê dişopîne û Ehmedînijad jî ragehandiye ku destêwertdana Natoyê kêşeyan aloztir dike.

Li Îraqê binêrin! seba vê ku çeka navikî tunebû Amerîkayê bi hêsanî êrîşî ser vî welatî kir û deshilata Sedam ji nav bir. Yek ji karnasên Musadê ragehand ku hikûmeta Îranê ji êrîşa Amerîkayê pirr ditirse û li ser vê bawerê ne ku heke Îraqê bombeya navikî heban Amerîkayê êrîşî ser wan nedikir, lewra bombeya navikî dikare desthilata wan ji ,jinavçûnê biparêze.

Heke heya salekê berî niha ew fikar tenê hestek bû, lê niha ew hest piştî Buhara Ereb xwedîhêz bûye.

Rojava bi sala ye ku Îranê han dide desta ji programa xwe ya navikî hilgire, lê Îran serbarê tehrîmên herî tund ên navnetewî bersiva erênî nade wan. Li gorî gotina karnasan heya niha Îranê seba vê ku keresteyên wan baş kar nakin nekarîne bombeya navikî bi dest bixin. Lê di hemen dem de ragehandine ku Îran dikare li heyamê şeş mehan de bomeya navikî çê bike.

Armanca hikûmeta Îslamiya Îranê wek hikûmetek mesebî û Îslamî hinartina şoreşa slamî bo derveyî Îranê ye. Lê em dibînin ku Amerîka hêzên xwe ji Îraqê vedikişîne û Îran jî dixwaze ku vê valatiyê bi mesajeke Îslamî pir bike. Di van salên daviyê de Îranê berdewam dijayetiya Amerîkayê û civatgeha navnetewî kiriye. Kiryara herî daviyê terhê terora balyozê Erebistanê li Amerîkayê de bû ku armanc jî ew bû mezinahî û hêza Amerîkayê û rêberiya cîhanê bibe jêr pirsyar.

Îranek xwedî bombeya navikî gefek micid bo ser Rojhilata Navîn û herweha cîhanê ye jî. Hêzên mezin ên rojavayî divêt niha pêde zêdetir ji Buhara Ereb giringiyê bidne pêşîgirtina ji destpêregihîştina Îranê bi bobe navikî.

Çavkanî: **UroAsya**



Rojev

# Rojeva siyasî a Sûriyê

Kongireya Nîştimanî ya Kurdî li Sûriyê pêk hat

Pêka nûçeya "Netkurd"ê, yekemîn Kongreya Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê bi rêveberiya 10 partiyên kurd û bi beşdarbûna li derdora 257 endaman ji kesayetiyên serbixwe û nûnerên 10 partiyan û hin hevkariyên ciwanan pêk hat.
Kongreyê di 26-10-2011'an de li Qamişloyê destpêkir. Ji her herêmeke kurdî û deverên ku kurd li Sûriyê lê dijîn wek Reqa, Heleb û Şamê li derdora 150 nûnerên serbixwe ji bo beşdarbûna di kongre de hatibûn hilbijartin.
Di destpêkê de endamên kongirê bona rêzgirtina ji riha pak ya şehîdên miletê kurd û şoreşa Sûriyê bîstekê bêdengî ragirtin, piştre sirûda nîştimanî ya kurdî "Ey Reqîb" û sirûda welatê Sûriyê hatin guhdarîkirin.

Bi gotina sekreterê Partiya Pêşverû ya kurd li Sûriyê, Ebdilhemîd Derwîş kongre dest bi kar û programê xwe kir

Ew mijarên ku hatin geftûgokirin û biryarkirin, ev bûn:
- Daxwaza mafê çarenûsê ji bo miletê kurd li Sûriyê.
- Di kongreyê de Encumana Nîştimanî ya kurdî li Sûriyê hate damezirandin.
- Kongre xwe beşek ji opozîzyon û şoreşa gelêrî ya miletê Sûriyê dibîne û dê piştgirî û xwedîlêderketinê ji hevkariyên ciwanên kurd re bike.

- Kongre doza guhertina bingehîn ya rêjîma Sûriyê dike.
- Kongre kuştina milet bi destên hêzên ewlekarî û leşkerî yên rêjîma Sûriyê şermezar dike û doza derketina wan hêzan ji nav bajarên Sûriyê dike.
- Kongre bi tena xwe diyalogê bi rêjîma Sûriyê ya niha re nake.
- Hemî hevbendên partiyên kurdî yên berê (Hevbendî, Enî, Encûmana siyasî, Hevkarî) di kongre de hatin hilweşandin.
- Ger ku hevbendên oposîzyona Sûriyê (Ragihandina Şamê û Encûman Niştimanî û Komîteyta Hevkar) belge û biryarên kongireya kurdî nepejirînin, partiyên kurdî yên di wan hevbendan de wê di hindirê 2 mahan de ji wan hevbendan vekêşin.
Kongireya Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê bi hilbijartina komîteyeke ji 45 endaman (20 ji partiyan û 25 serbixwe) bo rêvebiriya Encûmana Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê di 27-10-2011'an de bidawî bû.

6 partiyên kurdên Sûriyê yên ku di kongre de beşdar nebûn ev in:
1- Elpartî Demoqratî (ya bi serokatiya Ebdilrehman Alocî). 2- Partiya Wîfaq ya Demoqrat (Rêkeftin). 3- Hevgirtina Gel. 4- Yekîtîya Kurdistanî. 5- Partiya Yekîtiya Demoqrat (PYD) 6- Şapêla Pêşeroj ya kurd li Sûriyê.

### Rejîmê pêşniyaza Komkara Ereb qebûl kir!

Yekîtiya Ereb bi serokatiya Nebîl Elerebî civînek pêk anîn û hinek pêşniyarên wek: ragirtina kuştara neraziyan, paşvekêşana hêzên Ewlekariyê li ser şeqaman, û destpêkirina gotûbêjê di navbera hikûmetê û serhildêran, azadkirina girtiyan, daxwaz ji rejîma Beşar Esed kirin da ku ji vê kirîzê derbas be.
Li ser bingeha vî terhî wê tewaya hêz û aliyên neyar bi nûnerên nîzama Sûriyê re wê gotûbêjan bikin.
Yekîtiya Ereb gef kir ku heke rejîma Suriyê bersiv nede û amade nebe ku di gel neraziyan gotûbêjan bike, îmkana êrîşa bo ser vê rejîmê ji aliyê Rojavayiyan ve heye.




### Hikûmeta Sûriyê çend seetan piştî pejirandina pêşniyazê dîsan wehşeta xwe berdewam kir

Hevdem digel şirovekirina bersiva erênî ya dewleta Beşar Esed bi gelaleya Yêkîtîya Ereb, derbarê bidawîanîn aloziyên navxweyî ên Sûriyê,li bajarê Humsê hêzên ewlehî dîsan 13 kesên din kuştin.
Rojên şûndatir jî bi hemen şêwe li ser kuştina xwenîşanderan berdewam bû û dîsan sozên xwe bi cih neanî. Xwenîşanderan roja Înê bi îna Elahu ekber bi nav kirin û bi awayek girseyî derketin ser şeqaman û durûşma hiloşîna rejîma Esed qîriyan. Lê hêzên rejîmê bi awayek hovane ber bi rûye wan bû û bi dehan kes kuştin û birîndar kirin. Bi vê çendê jî dîsan selimand ku tu baweriyek bi reforman û daxwazên Xwenîşanderan nine û dê her li ser şopa xwe ya serkutê bimeşe.

www.persiankurd.org

# Para Kurdan pîsbûna jîngehê ye



Ceifer Mubeşirniya

Berpirsên hikûmetî ên Komara Îslamî tim îdia dikin ku xelkê Îranê di refahê de dijîn û carna jî sozên direwîn weke "tiştek bi navê bêkariyê di Îranê de nemaye yan kêmser bûye, yan emê pereyê neftê bînin ser sifreya xelkê û ...hwd" hemû li halekê de ne ku xelkê Îranê bi giştî û gelê Kurd bi taybetî li hejarî û belengaziyê de dijîn û di nava kirîza bêkariyê de çeqiyane, giranî hawarê dike û jiber wan kirîzan, gellek diyardeyê xirab serî hildane ku hêdî hêdî civakê biçok de tînin.

Eva jî li halekê de ye ku Îran û Kurdistan welatek dewlemend bi çavkaniyên binerd e û dahatek yekcar zaf ji vê riyê ve bidest dixe, lê him xelkê Îranê û di nava wan de jî xelkê Kurdistan perawêzxistî û bêpar ji vê sermiyana mezin a xaka xwe ne.

Ger li gor pîvanên coxrafiyayî, dahata salane û sermiyanên giştî û çavkaniyên binerd, nirxandina Kurdistana Îranê bihê kirin, renge kêm welatên pêşkevtî û xwedî abûriyek bihêz ên hevrûberên Kurdistana Îranê hebin ku tiştek pêtir ji çavkaniyên siroştî û hilkevtek cuxrafiyayî a bikêrtir weke Kurdistana Îranê hebin.

Kurdistana Îranê, deverek pirr ji xizîne û dewlemend bi çavkanî û sermayeyên binerd, weke: Nift, xwê, mermer, mermerê sor, giranît, mîka, dolomît, filorîn, birîl, kevirê hesinî, mengeniz, antîmwan, mîs, zêr û barût e. Niha 140 ji wan çavkaniyan mifah jê tê standin û salane 405 ton madeyên binerdî tên derxistin, lê bêy wê ku tu karxane û fabrîkayek di herêmên Kurdakincî de hebe, di rastî de hemû ji aliyê desthilatdarên rejîma Îranê ve tê talankirin.

Her yek ji wana xenîmet û sermayeyek in ku ger siyasetek paqij û durust a abûrî li ser de bimeşe, ne tenê dê abûriya deverê pêşve dibe û bêkariyê çareser dike, belkî tesîrek baş li ser hemû abûriya Îranê jî dê hebe.

Niha piştî 32 salan, taze rêberê Komara Îslamî di seferek xwe de bo Kurdistanê radigihîne ku hest bi bêkariyê di wê deverê de kiriye, hestek ku 32 sal e çalakên kedkarî, bankên cîhanî, xelkê deverê û rewşa jiyana gelê Kurd li Kurdistana Îranê hewara wê dikin. Piştî wê axaftinê



hikûmetê gelaleya danîna karxaneyek şimşên zêr li bajarê Qurwe, ser bi parêzgeha Sine derxist holê û têde 3 hezar derfetên karî tên pêkanîn, lê xuyaye ku serbarê tevlîhevkirina jîngeh û pîskirina seqaya Kurdistanê, xelkê bomî dê jê bihên bêpar hiştin û tenê hesret û êş bibe para xelkê deverê.

Evana û çendîn çavkaniyên din ên weke gola Urmiyê, kangaya kevirên Giranêt a Pîranşarê û bi sedan ên din ku her yek ji wana çavkaniyên başin bo derfetên karî ji xelkê kurdistanê re, lê ne tenê nebûye derfet ji wan re, belkî bûye janeser û çavkaniya nehametî û ew sermiyana mezin tê talankirin.

Bi hebûna wan xizîneyên sermiye û derfetên kar di Kurdistanê de, ciwanên Kurd bêkar in û bo bijîva jiyana xwe bi neçarî rû ji karên sînorî û giran dikin, lê dîsan jî boseya hêzên nîzamî ên rejîmê û hingavtina sînga wan çavnihêriya ciwanên Kurd dike û rojane em şahidê van bûyeran in.

Ji aliyek din ve jî her seba bêkariyê û kêmdahatiyê, ciwanên Kurd dev ji xwandinê berdidin û nexwastî tûşî diyardeyên xirab ên weke îtiyad, fesad û ... , ku encama siyasetên rejîmê derheq gelê Kurd in dibin.

# Çanda tund û tûjiyê di Îranê de



Rêbwar Fanî

Di cîhana îro de, aştî mercê sereke yê geşekirina demokrasiyê ye. Tund û tûjiyên ku di van çend salên derbasbûyî li cîhanê hene, gellek kes mijûlî peydakirina çareseriyek bo dijberîkirina wan tund û tûjiyan kiriye. Em di cîhanekê de dijîn ku ji çand, hizrîn û îdolojiyên cur bi cur pêk hatiye, renge hin ji wan çand û îdolojiyan dijî hevdu bin, lê eva mirov e ku divê têgihîştinek ji erkê mirovî yê xwe hebe û mirovan weke mirov mêze bike ne ku weke îdilojiyek dijberî xwe.

Herweha dema vê çendê gihîştiye ku mirov girîngiyek taybetî bi mijarê tund û tûjiyê di warên siyasî, civakî û abûrî de bide.

Yek ji pirsgirêkên bingehîn di Îranê de hebûna çanda tund û tûjiyê ye. Mixabin ev çand di nav xelkê Îranê de cihgîr bûye. Bûyerên weke destdirêjiyên cinsî, mêzekirin li îdaman û mijarên wusa, nîşanderê misogerbûna çanda tund û tûjiyê ne.

Di pênaseya rejîma Komara Îslamî de, tund û tûjî yek ji faktorên bingehîn ên wê rejîmê ye. Helwestên rejîmê li hember bûyer û diyardeyên civakî jî, helwestên nerênî ne, Dezgehên pêwendîdar bi pêragihîştin bi pirsên civakî, tenê ji riya tund û tûjiyê nas dikin. Îdamên birfireh di Îranê de mînakek ji geşekirina tund û tûjiyê di nav civakê de ne.

Hêjayî gotinê ye ku hemû xelk li hember diyardeya tund û tûjiyê berpirsiyar in û guhertina rewşa han hewcehî bi guhertina hizrîna xelkê heye.

32 sal berî niha piraniya xelkê Îranê wusa difikirîn ku bi hiloşîna rejîma Pehlewî, rê bo gihîştin bi azadî û demokrasiyê xweş dibe. Du dirûşmên sereke ên şoreşa sala 1979'an, azadî û xweserî bû, lê mixabin tu girîngiyek bi eslê dijayetî li gel tund û tûjiyê nehate dan. Di wê rewşê de gellek ji xalên destûra bingehîn û yasayên civakî li ser bingeha tund û tûjiyê hate darêtin û ne tenê xelkê Îranê negihîştine azadiyê belkî rewşa Îranê di her warekê de ber bi xirabtirbûnê ve çû.

Divê em vê çendê li ber çav bigrin ku gihîştin bi civakek azad û demokrat, hewcehî bi hewldana xelkê ji bo binbirkirina çanda tund û tûjiyê heye. Ku wusa bû hikûmet dikeve jêr givaşek zaf û neçar dibe ku di nav yasayên xwe de guhertinan pêk bîne. Di vê rewşê de tu cihek bo kesên alîgerê çanda tund û tûjiyê namîne û herweha civak jî ber bi demokrasiyek esîl diçe.



www.arsivakurdi.org

# Rêberek bîrtîj û şoreşvanek dûrbîn



Arif Velzî

Di demekê de ku aramî û tenahî a piştî bidawî hatina şerê duyem ê cîhanî li dunyayê bi giştî û rojhilata navîn bi taybetî cihgîr naebibû, herweha di demekê de ku rewşa xwendin û asta rewşenbîrî li Îranê di astek gelek nizm a xwe de bû û perwerde û hînkirin ji rêya qutabxaneyên sunetî û olî ve dihat birêve birin û ...

Di demekê de ku sîstema eşîretî û lawaziya çandî û rewşenbîrî bal bi ser herêmên ku kurd têde akincî bûn kêşabû û xelkê kurdistanê tu nasîn û şarezayî li ser pêwîstî û girîngiya perwerde û hînkirina di warên curbicur ên ku bo jiyana her mirovekî pêwîst in nebû, babê nasyonalîzma kurdî wate Simayîl Axayê Şikak naskirî bi Simko di herêmên navbera Îran û Turkiyê de şoreşek birêxist ku li serdemê xwe de kêmwêne bûye, lewma ye ku neyarên kurdan û herwiha gelek kurdên xizmetkarê deshilatdar û hakimên zal bi ser kurd û kurdistanê de ku qelema xwe bi nirxek erzan firotin, ketine hewla çewaşekirina dîroka rengîn û pir ji qehremanî û rizgarîxwaziya egîdên wekî Simayîl Axayê Şikak, Qazî Mihemed, Şêx Mehmûd Berzencî, û gelek rêber û şoreşvanên kurdan û bi şêwazek bêrehmane û dûr ji wîjdana mirovatiyê bi talançî, diz û îxanetkar binav dikin.

Lê berevaj, şoreşa Simayîl Axa, şoreşek siyasî, netewî, candî, kultûrî û rewşenbîrî bû ku xizmetek gelek mezin û dîrokî bi netewa xwe kir.

Eger em lêkolîn û pêdaçoneke zanistî û rast li ser şoreşa Simko, helkewta zemanî û mekanî a şoreşê, sîstema civakî ya wê demê a kurdistanê, sîstema hikûmetên zal biser kurdistanê û hikumetên cîran û berjewendiyên abûrî û siyasî yên hevpare wan û gelek xalên din ku birastî weke asteng û pirsgirêk liser rêya geşekirina çandî a civakê tên hesibandin bikin, der dikewe ku di hember pirsgrêk û arîşe yên han di wê serdemê de, deskevtên dîrokî û giring yên Simko û şoreşa Simko gelek bi buha û mezin in.

Yek ji wan deskevtên mezin û serdemî yên Simko, ew bû ku wî bo cara yekem di dîroka rojhilata kurdistanê de, bi hevkariya Ebdulrizaq Bedirxan di sala 1912 an li bajêrê Xoyê kovarek mehane bi navê Kurdistanê derxist.

Deskevta din ya herî binirx ku bû sedema kerb û kîna deshilatdarên wê demî ye Îranê, avakirina yekemîn qutabxaneya bi zimanê kurdî di sala 1913'an de li bajêrê Xoyê de bû.

Deskevta din a dewleta Simko, avakirina Civata Rewşenbîrî a kurd bi navê "cîhandanî" ye ku bi hevkariya Ebdulrizaq Bedirxan li sala 1913'an de hat damezrandin.

Herweha anîna çapxanê bo bajarê Urmiyê û derkirina rojnameya Roja Kurd ji aliyê organa nawendî a bizava rizgarîxwazî a Simko ve bi sernvîseriya Mela Mihemmed Turcanîzade (li çapxaneya Xêyret li bajêrê Urmiyê) hewl û xebatekî din ya hêja û dîrokiye şehîd Simko ye.

Piştî deskevtên han derdikewe ku Simko, rêber û rewşenbîrekî bîrtîj, şoreşvanekî biwêr û dûrbîn, kesayetiyek xwedî helwest yê netewa xwe ya hejar û zulmlêkirî bûye.




Şehîd Simko bi şoreşa xwe ya pir ji şanazî û serbilindî da selimandin ku tekoşîn, berxwedan û xebata ji bo azadî û serbestiya gel çiqas biqedr û qîmet e û bi wan deskevtên şoreşa xwe îsbat kir ku rewşenbîrekî serdemiyane û dûrbîn bûye ku di çaxê dashilatdariya xwe de rolek binirx di hişyarkirin û geşandina asta rewşenbîrî û çandiya gelê xwe de lîstiye.

# Zalbûna hunermendên hikûmetî bi ser sînemaya Îranê



Sadiq Vehdanî

Gava ku bas ji hunerê tê kirin, wateyek bilind a mirovî tê berçavê me. Û kesên hunermend jî, hertim weke kesek têgihîştî û mezin tê berçav ku hemû hewlên wan xizmet bi mirovatî û çanda mirovatiyê ye. Lê di Îranê de wateya huner weke hemû wateyên mirovî ên din, wateyek cuda hene. Di nêrîna karbidestên rejîma Îranê û hunermendên derev ên ser bi rejîmê de, serbestbûn û dilsojbûn bo çandê weke fehşa û fesada exlaqî tê binavkirin.

Di wî welatî de mirovên îxanetkar bi çandê ji aliyê hikûmetê ve tên piştîvanîkirin. Çend roj berî niha "Fereculla Selehşûr", yek ji wan hunermendên hikûmetî ku xwe bi derhênerek serkevtî dizane, di hevpeyvînek tevî yek ji malperên hikûmetî ên rejîmê de axaftinek derheq bangkirina Ancilîna Cûlî(hunermenda Halîwûdî) bo Îranê û herweha li ser rewşa sînemaya Îranê kir ku di rastî de nêrîna rejîmê li hember hunerê nîşan dida. Nêrînek ku têde hunermend bi fahişe û sînemayek ku bi dilê rejîmê nebe bi fehşaxane dizane.

"Selehşûr" di axaftina xwe de gotibû ku jinên sînemager ên Îranê hez dikin ku wêneyên wan di nav belavokan de bi awayek neîslamî bê nîşan dan. Navhatî bi bê liberçavgirtina pêgeha sînemakaran, ew bi fahişe binav kirin û sînemaya Îranê weke fahişexane zanî.

Eva di halekê de ye ku bixwe jî di vê sînemayê de kar dike. Yûsifê Pêxember, berhema herî bi nav û deng ya Selehşûr e ku di sala 1387'a Rojî ji Deng û Rengê televîzyona Komara Îslamî bilav bû. Hêjayî gotinê ye ku piştî nîşandana fîlma han, di dadgehekê de "Selehşûr" bi tawana dizîna fîlmnameya Yûsifê Pêxember bi 3 sal zîndanê hat mehkûmkirin ku paşan ev hukm hat helweşandin.

5 ekterên jin ên navdarên sînemaya Îranê li hember axaftina Selehşûr derheq sînemaya Îranê, dijkiryarek tund nîşan dan û di beşek ji nameyek servekirî a wan de hatiye: "Eva ku em dibînin hûn jiyana pêxemberan li warên cur bi cur de dikişînin ser ekranê û akar û reftarên wan dikin mînak ji xwe re, lê em gellek xembar in ku vê yekê nekariye bandorê li ser axaftin û kelamên we hebe. Di encam de, em bi vê nav û dengiya ku we bi nifret, kîn û sivikatîkirin bi hevpîşeyên xwe bidest xistiye, pirr xembar in".


Herweha "Ancilîna Cûlî" jî li hember axaftinên wî derhênerê hikûmetî bêdeng nema û di nameyekê de nêrîna Selehşûr li hember sînemaya Îranê şermezar kir.

Mixabin di sînemya Îranê de kesên weke Selehşûrê kêm ninin. Ew hunermendên direwîn ku tu têgihîştinek ji huner û sînemayê tunin in û bi piştevaniya rejîmê bûne hunermend û erkê wan tenê cî bi cîkirina siyasetên nepaqij ên Komara Îslamî di warê çandê de ye.

Eva di halekê de ye ku li Îranê derfeta karkirin ji hunermendên rastîn bi taybetî di warê sînemayê de hatiye standin. Piştî şoreşa 1979'an û bi hatinsarkara rejîma Melayan, gellek ji sînemakarên xweser ên Îranê neçar bûn ku Îranê bi cih bihêlin. Sînemakarên din ku dixwastin di welatê xwe de kar bikin ketin jêr givaşa rejîmê û berhemên wan ketine jêr sansor a Komara Îslamî de.

Di çend salên derbasbûyî de û li pey darêtina siyaseta Îslamîkirina hemû aliyên jiyana xelkê û bikaranîna îdeolojiya Komara Îslamî li berhemên çandî de, pêvajoya sansor û dijberî li hember sînemakarên sikolar zêdetir bûye û sînemakarên navdar ên Îranê weke Behmen Qubadî, Ebas Kiyarostemî, û gelek kesên din êdî tu derfetek bo karkirin di Îranê tuninin.

Dijatiya rejîmê li hember çand û hunerê di 32 salên derbasbûyî de bi sansor, girtina hunermendan, destêwerdanên hikûmetê di berhemên hunerî de û axaftinên wusa ji zarê hunermendên hikûmetî, hatiye selimandin.



www.arsivakurdi.org

**hunermend Aynûr Doxan:**

# "Hunermend oksîjina miletan in"



**Amadekar: Letîf Epozdemir/ Stenbol**

**Aynûr Doxan Kê ye.?**

Hunermenda Kurd Aynûr Doxan, sala 1975'an li parêzgeha Dêrsim bajarokê Çemizkezek hatiye dinyayê.

Sala 1990'an malbata Aynûr koçebarî Stenbolê bûye.

Hunermenda Kurd li ASM (Navenda Hunerî a Arif Sax) waneyên tembûr û sitrangotinê wergirtine.

Piştre dîsan li Akadîmiya Stembolê waneyên huner û stranbêjiyê xwendine.

Sala 2002'an kasêtek bi navê Seyîr, bi Turkî derxistiye.

Lê mixabin ku ew xebata Aynûr tu dengek nebûye.

Cara duyan dîsan neqrekî bi Turkî derxistiye. Lê ew jî wek a bere maye bêdeng.

Aynûr, piştî wan xebatên xwe bi humermendên wek Metîn - Kemal Kahraman, Grup Yorum, Lutfû Gûltekin, Anjelika Akbar û Orient Expressions xebitiiye û li cem wan vokalîstî kiriye.

Hunermenda hêja di sala 2004'an de kasêtek Kurdî, bi navê "Keça Kurda" tomar kiriye. Ev xebata Aynûr di demek kin de deng veda û li seranserê welat Aynûr ji nû ve hatiye rojeva hunerzan û mûzîknasan.

Di gulana sala 2005'an de, li gel girûpa mûzîka Hollandî a bi navê NEDERLANDS BLAZERS ENSEMBLE, li Holland û Beljîka şeş konser dane.

Her wiha di Tebaxa sala 2005'an de jî, li Ispanyayê di festîvala mûzîkê a bi navê "Turkiye Festivali" de cih girtiye. Aynûr di vê festîvalê de bi hunermendên navdar ên weke Sezen Aksû, Erkan Oğur, Kardeş Türküler, Mercan Dede, Burhan Öçal re konser li dar xistine.

Herweha dîsan di sala 2006'an de, li İspanyayê, li bajarê Sewîlla yê festîvala Womek (Word Music Espo) beşdar bû.

Di sala 2008'an de, di festivalên ku hunermendê navdar ê Cihanî Peter Gabriyel bi navê Womad li dar dixe, Aynûr jî cihê xwe girt û sitranên Kurdî gotin.

Di vê salê de (2008) kovara Sons ku li İspanyayê çap dibe, ciyeke berfireh da Aynûrê û pêre hevpeyvinek çêkir.

Sala 2010 an, festivala Kustendorf a Film û Mûzîkê ku derhêner Emîr Kusturica bi rêve dibe, ji bo konsertekî bangî Aynûrê kir û konserek mûzîka Kurdî bi dengê Aynêrê peşkeş kir.

Aynûr dibêje:"Ez li gundan hatime dinyayê û li gund mezin bûm. Dema ku ez hatime Stenbolê min dest bi mûzîkê kir. Dema ez li gund bûm di jiyana min de Mûzîk hê tunebû. Lê min guhdarî dikir. Dema min li ba hevalên xwe car caran sitrana digotin, ewan ji min re digo" dengê te gelek xweş e tu bo çî sitranbêjîyê nakî.?" Ev yek di serê min de cih girt. Paşî min dest bi xebatê kir."



Aynûr heyamê du mehan li bajarê Viyana maye. Li wir jî her li ser kar û barên hunerî xebitiye.

Paşî jî çûye İngilistanê. Sefera wê deverê mecal daye Aynûrê ku li ser paşeroja xwe ya Mûzîkê bi ponije û biryarên nû werbigre.

Di fîlma sînemayê a Turkî ku bi navê GÖNÜL YARASI ( Derdê Dil) tê zanîn de, sitrana xwe a bi navê Dar Hejîrokê gotiye û heza gelek kesan wergirtiye.

Piştî vê yekê, li Turkiye û Ewropa nav û dengê Aynûrê hêdî hêdî belav bûye.

Jiyana hunerî a Aynûrê di sala 2003'an de, dema ku li bajarê Antalyayê, bi Anjelika Akbar re hev naskirin, guheriye û rengîntir bûye.

Aynur di konsera Ancelkîka Akbar de bi sitranek Kurdî vokalîstiyê kiriye.

Kasêta Aynûr a yekemîn "Keça Kurda" berhema piştî vê hevdîtinê ye.

Helbet Aynûr bi deng û awaza xwe di demek kin de li seranserê Ewropayê jî hate naskirin. deng û awazek narîn û bi hêz, reng û dengek Kurdî, terh û terzek Ewropî, bû ku bala Ewropiyan dikşand ser Aynûrê.

Kovara İngilisî ya bi navê "FOLK ROOTS (FROOTS)"di hejmara xwe a kanûna sala 2004'an de li ser berga pêşîn behsa huner û serkeftinên Aynûrê kir û pê re hevpeyvînek li dar xist.

Piştî vê hevpeyvînê êdî Aynûr bû hunermendek Kurd a navnetewî. Kovarê manşetek bi navê" KURDEKE Lİ SER RÊ" ji bo Aynurê danîbû.

Keça Kurd Aynûr bi Kurmancî, Soranî û Zazakî kilam û sitranan dibêje.

Aynûr heya niha bi dehan car li Turkiyê konser pêk anîne. Xêncî Turkiyê, li gelek welatên Cîhanê jî Aynûr baş tê nas kirin. Heya niha Aynûr li Îrlenda, Singapûr, Amerîka, Kanada, Portekiz, İspanya, Almanya, Birîtanya, Tûnis, Sirbistan, Slovenya, İsviçre, Belçika, Danimarka, Finlanda, Hulenda, İsvec û Yunanistanê bi Kurdî konser çê kirine û mûzîka Kurdî bi gellek wan welatan daye naskirin.

Kasêta Aynûr a bi navê NÛPEL di sala 2005 an de derketiye.

Berhema dawîn ( 2010) REWEND e ku ji alîyê şirketa Mûzîkê a Turk ku bi navê SONY Music tê naskirin, hatiye çê kirin.

**Li gorî raya we, îro rewşa Mûzîka Kurdî çawa ye?**

Her wek tê zanîn ku îro, hêj jî xasima li Turkiyê, gelek pirsgirêk û kêşeyên mûzîk û hûnera Kurdî hene û hemû jî li benda çareseriyê de ne.

Ji asimîlasyon, pişaftin û talankirinê, bê gûman mûzîk ji hemû waran zêdetir para xwe distîne.

Ên ku sitranên welatan çê dikin, ji wanên ku zagonên welatan çê dikin, hêjatir û bi rûmettir in. Ev gotinek pir bi nirx e. Lewraye ku asimîlasyoner ewil ji pişaftina mûzîka Kurdî dest bi kar kirine.

Her weha Mûzîka Kurdî gelek jar û zeîf bûye ji ber derb û zerbên biyaniyan. Wisan ku ber bi bê pênaseyiyê ve daketiye rê. Ev rê rêya xeter û nemanê, rêya xela û mirinê bûye. Ger xebatên akademîk çê nebin, bêşik mûzîk tenê bi serê xwe nikare ji vê rêyê vegere.

Korr, tîm û ekîbên lêkolîner dikarin di nav xwe de her kes li gor zanebûn û pisporiya xwe, kar û barên xwe dabeş bikin û bi hêz û xebatek bijare wê mûzîka ku niha sewse û hatiye tewş kirin, carek din ji nû ve bi ser esl û astarê wê ve, bi paşve vegerînin.

Ev hêvî min zêdetir heyecan dike û ez bawer im ku bi xizmet û xebatên wiha di zûtirîn dem de wê gelek berhem û çalakiyên baş bi dest bikevin.

Her weha cihyê şanaziyê ye ku êdî keyfxweş im ku desteyek bijare lêzan û agehdarê mûzîkê ji nav jenerasyona nû a Kurdan de perwerde dibe.

Ez bawer im ku dem û dezgehên mûzîka Kurdî çiqas zêde bibin ewqas başe û wê, ew dezgeh karê me hêsantir bikin.

Hewce ye ku rojek zûtir mûzîka Kurdî vegere ser koka xwe. Herweha taze aj bide û rabe ser pê. Vî karî jî, tenê korrên xebatê, dem û dezgehên akadîmîk û zanist dikarin bixin hewilê.

**Bi raya we jibo ku mûzîka Kurdî bigîje astek giranbuha, çi bê kirin?**

Ya rast îro jî Mûzîka Kurdî gihiştiye astekî berz û bilind. Li hember bi duh, gelek gavên baş hatine avêtin. Ji roja ewil û hetanî îro mûzîkê dawî bi jiyana xwe neaniye. Lewra fulkulûra Kurdî tenûr û kûreya mûzîka Kurdî bûye. Dengbêjên Kurd wekî bilbilên baxê beheştê, her sitrîne û ji ser lêvên xwe sitran û kilam

www.arsivakurdi.org

kêm nekirine hetanî îro. Di dîwan û hizûra mezin û mêvanan de her dem wekî şalûl û bilbilan destê wan li pala gûhê wan bûye û xasima di wan şevên dirêj ên zivistanan de hetanî berê sibê qîriyane.

Ev kevneşopîyek taybetî û serwetek hêja ye di destên hunermendên Kurd de ku dikarin pê kûbariyê bikin. Lewra şansek wiha di destên kêm hûnermendên dinyayê de heye.

Sedem ku xezîneyek wiha giranbuha di destên me de heye, hewce ye em jê gelek îstifade bikin. Reng û rûyê mûzîkvan çi be, bila bibe, divê ew ji kaniya fulkulûra Kurdî dûr nebin û jê avê vexwen. Her hunerek li ser aqara xwe perwerde dibe û digîjê astên bilind.

Heyf û mixabin ku îro gelek hunermend û sitranbêj hene di nav şaşiyek mezin dene û her tim bi wî alî, vî alî ve kaş dibin. Ew nizanin ka gelo çi bikin. Di nav aloziyek pênasî de ser û dilê xwe diêşînin. Hewce ye ku ew dev ji xwe kaşkirinê berdin û bi zûyî vegerin ser kaniya folkulûra xwe û tênîtiya xwe li wê bişkênin. Wê bibînin ku ew ê serfiraztir û dilşatir bibin.

Îro divê li gor dengên nûjen ên dûnyayê em jî mûzîka xwe bi pêş ve bibin. Dengê me li derveyî sînorên me jî bê bihîstin. Her dema ku guhdarîya me bikin bizanin ku em Kurdin û ew sitranên li ser lêvên me berhemên folkulûr û çanda Kurdî ne. Ez li gor karîna xwe wezîfeyek weha dikim. Helbet bi min wisa xuya dike. Nizanim gelo ka bese yan na.. ?

Bê şik tenê cehd û hewla min jî, ne bes e. Pêwîst e gelek kesên din jî berê xwe bidne ser deng û mûzîka dinyayê. Lê li ser koka xwe tiştên nû nûjen bi afirînin.



**Em dikarin bêjin hunermendên Kurd bi her awayî mafên ku divê bê dayîn distînin. Him ji aliyê gel, him ji aliyê sazî û dezgehan û him ji aliyê abûrî ve?**

Bi rastî em îro nikarin bêjin ku yek hûnermendê me jî, di hal û mercek baş de dixebite. Her wiha rewşa abûrî û zirûfên civakî mixabin ne li gor xwesteka dilê me ne. Lewra em hûnermendên mileteke bindest in.

Li her cihekê dinyayê xebatên çandî û hûnerî ji aliyê dezgeyên herêmî yan jî dewletî ve têne piştevanî kirin. Yanî hûner saziyek bilind e û perwerdebûna hunerê jî lazim e were paldan û ev kar hewceyê piştgiriya dewletê heye.

Lê em xwediyê tiştek wuha ninin. Lewra em hê jî sêwîne li dunyayê u bê xwedî ne. Lewra tenê kûrd in ku li ser rûyê erdê nifusê wan ji 50 milyona zêdetir e û hêj jî, bê dewlet in.

Di halek weha de ne qabile ku em di hemû warên jiyanê de, di kar û barên hûnerî de û di jiyana civakî de serfiraz û rûgeş bin. Tu dem û dezgeyek me tune ku nîşanên liyaqetê bide me. Em hûnermendên gelekî bindest in ku zor caran sitranên me xewa nevana di revînin. Wê çawa ew qedrê me bizanibin. Tenê dimîne gelê me yê reben. Ew di nav vê şerpezehî û bextreşiya xwe de wê bikare gelo çiqas me li ser destan bigre û qedir û qîmeta me bi parêze? Yan jî jiyana me a aborî wê çawa bi gîje astek hevdemî di hal û mercek wuha de.

Lê dîsan jî em ewqas gilîkar nebîn baştir e. Eger têr û eger birçî, lazim e ku em dengê sitranên xwe nebrrin û her tim bi lorînin da ku rojên xweştir, bibînin.

**HÛNERMEND OKSÎJENA GELÊN XWE NE.**

Dema dengê hunermendan bê seknandin, miletê wan nikare nefesê bistîne. Lewra em bi dil û can di her qonaxî de hewl didin ku nefesa gelê me neyê birrîn.

Hîvîdar im ku di demek kurt de rewşa hûnermend û mûzîkvanên Kurd wê baştir bibe.

**Hûn dikarin ji mereji bo rewşa mûzîka Kurdî a pêşde çi bêjin?**

Hewc ye mirov bi zaniyariyên mûzîka Turkî, mûzîka Kurdî şirove neke. Lewra herdu ne yek tişt in.Herweha her yek ji wan zirûfên xwe ên taybetî hene. Her yek ji wan di merc û aqarên xwe de perwerde dibe. Ev herdu ne berevajiyê hev in. Bi hemû şîweyan ji hev cûda ne û heta




mirov dikare bêje ku ne cînarê hev in jî. Lewra zimanê herdukan jî her yek ji cihekê derbûye ku nêzîkî hev jî ninin.

Dîsan raman, çand û folkulûr û zargotina herdukan jî ji hev gelek dûr in. Sedems vê yekê, xeterên li ser rêya mûzîkê ji bo herduyan, ne bi yek reng in. Yanî wekî ku tê qebûl kirin Arabesk li ser rêya mûzîka Turkî xeterek mezin e. Lê di nav mûzîka Kurdî de hatiye hevîr kirin. Lewra êdî bûye parçeyek ji vê mûzîkê. Keza Pop, îro di mûzîka me de hê ranebûye ser pê û hêdî hêdî xûrt dibe. Bi guncan û îmkanên şexsî ne qabile ku zûtir geş bibe. Lewra berê hunermendên Kurd ê gelekan ber bi dinyayê ve ketiye.

Hunermendên me jî hê bi sererastkirin û têkûzkirina xwe ve mijûl in. Zêde hayê wan ji mûzîka cîhenê a îroyîn tune ye. Tenê ewên ku li derveyî welat dijîn ew hin nasyarin lê bê guman ev yek ne bes e. Hewce ye ku mirov li ser mûzîka xwe zana û hosta be. Dema ku mirov şarezayê mûzîkê be, mirov ji zimanê mûzîkê fêm bike. Wê demê karê mirov rihettir dibe. Bi vê yekê mirov dikare li ser mûzîka cîhanê jî serê xwe bi êşîne. Di vir de tiştê balkêş ev e ku divê mirov tu carî ji kevneşopiya mûzîkê veneqete û ji kok û reh û rîşelên mûzîka xwe a netewî dûr nekeve, ango jê cûda nebe.

Îro êdî mûzîka me jî mîna hemû warên jiyanê li ser rêya raperîn, perwerde û pêşveçûnê ye. Ez jibo pêşeroje hêvîdar im. Lewra ji niha ve van îşaretan distînim. Hewce ye ji başûr ve dest bi seferberiyê were kirin û bi zûyî mûzîk ji nav lepê dijwarî û xederayî bête felîtandin. Hewce ye zêdetir akademî û enstîtûyên hûner û mûzîkê bêne çêkirin û li ser mûzîka Kurdî zêdetir lêkolîn çê bin. Di radyo û televîzyûnan de zêdetir cih bidin mûzîka Kurdî û rêya geşbûna mûzîkê xweştir bibe.Televîzyûn û kanalên taybetî ên mûzîka Kurdî bêne damezrandin û li ser mûzîka Kurdî pispor li hev bicivin, bernameyek ajdanê çê bikin.

Her wek tê zanîn ku tu sazgehên fermî yan taybetî ninin ku pisporan perwerde bikin li ser mûsîq û torevaniya Kurdî. Ne bestekar û torevan û ristevan, ne aranjor û tonmaîster û supervîzeur û kesên pispor ên mûzîkê. Em jî mecbûrê mûzîkzanên Turkî ne.

Lewra kasît û newarên me pîrnî di tema Kurdî de ne lê hin caran jî bêhna Turkî ji wan tê. Helbet ev tişt pirsa hemû hunermendên Kurd in. Ev jî bêçareyiyek mezin e. Hewce ye konservwatûar û akademiyên Kurdî bêne danîn ku ev pirs çareser bibe. Eger dewlet neke jî, bi raya min belediyeyên Kurdî dikarin dest bavêjin tiştek weha û li ser vê pêşniyarê serê xwe bi êşînin.

**Xebatên we yên nû di çi qonaxekê de ne?**

Xêncî konser û festîvalên cur bi cûr yên navxweyî û navnetewî, niha xebateke min ê amadebûyî tune ye.

Lê ez li ser repertuwara xwe di xebitim û min niyete ku ez kasetek baş û xûrt amade bikim. Hê ev xebat ez baş dizanim kû bîzer û gûhdarên min ji min tiştên baştir hêvî dikin. Lewra ye ku ez jî acelê nekim.

Bi bêhna fireh wirde wirde ezê xebata xwe bidomînim. Dema ku min bi xwe got “erê temam. Êdî hevîrê me hazir e. Em dikarin bidne tenûrê. “ wê demê emê bîr û raya Kurd ji xebata xwe a nû haydar bikin.

# Agirî

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye
Ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

www.kurdistanmedia.com/kurdi
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat:
AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE
E - Mail: agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com



## Kompaniyên biyanî alîkarên rejîmê
### di girtina neraziyan de




**Di du salên derbsbûyî de hin kompanyayên biyanî sîstemên nerm efzarî û herwiha dezgehên casûsiyê firotine Îranê ku hêzên ewlekarî û Îtilaatî ên rejîma Îranê mifah jê wergirtine.**

Nûçegehaniya Blûmbêrgê eşkere kir ku zêdetir ji sed belgeyan bi taybetî piştî gotûbêjên bi berpirsyarên pêşîn ên şîrketên wek **Sony Ericsson a swîdî, Creativity Softwar a Birîtanyayî û Kompaniya Adaptive Mobaile Security,** dest wan ketine ku nîşan didin bi riya wan şîrketan ve rejîmê bi hêsanî kariye neyaran bi taybetî di meşên nerazîbûnên piştî hilbijartina sala 1388'an de, binçav destbiser bike.

Pêştir şirketa Nokya Zîmêns sîstem û dezgehên lêgerîn û guhdarîkirinê firotibû Îranê, lê li jêr guşarên navnetewî de neçar ma ku bazara Îranê bicih bihêle.

## Felsatîn bû endamê UNSCO' yê
### Amerîkayê ji heyfan butceya wê qut kir

**Piştî bi endam bûna Filistînê di Saziya UNSCO de, Amerîkayê ragehand ku biryarek bi vî awayî bi zirara UNSCO'ê ye û niha pêde em alîkariya malî ya vê saziyê nakin.**

Piştî wê ku Felestîn bi wergirtina 107 dengên erê, 14 dengên Ne,û 52 dengên bê alî bû endam di UNSCO'ê de, Amerîkayên alîkariya malî ên xwe bi UNSCO'ê qut kir.

Li gor ragihandina Wezareta karûbarê Derve a Amerîkayê, biryara ragirtina 60 miyon dolar alîkariya Amerîkayê bi UNSCO'ê weke mezintirîn alîkariya Amerîkayê bi vê saziyê hatiye dayîn. Li Amerîkayê di sala 1990'î de yasayek




hatiye pesendkirin ku li gorî vê yasayê her saziyek navnetewî ku Felestînê bi fermî nas bike, dikeve ber tehrîmên Amerîkayê.

## %99 ji xelkê Koreya Bakûr ji
### guhertinên cîhanê bê xeber in


99% ji xelkê Koreya Bakûr agehdarî bûyerên Lîbiyê nînin û ew yek nîşan dide ku xelkê wî welatî, agehdarî tu gorankarî û ne aramiyên



sala darbazbûyî di Rojhilata Navîn û welatên Erebî de nebûne. Li gorî nûçegehaniya Firansayê; Bi tenê %1 a xelkê wî welatî ku pêk hatiye ji berpirsên hikûmetî, hizbî û bazirganan, bi egera seferên xwe ji bo Çîn û welatên din haydarî wan bûyeran in. Hêjayî basê ye ku medyayên Koreya Bakûr derheq kuştina Qezafî û guhertina sîstema siyasî di Lîbiyê jiber sansora tund helwest negirtin. Eva jî nşan dide ku rêberê Koreya Bakûr sitûnên hikûmeta xwe bi taybetî piştî gorankariyên di cîhana Ereb de, lerzok dibîne.

## Di salekê de 603 kes bi sîlahên germ
### hatine kuştin

**Di bûyerek pirr bi jan û dilêş de bavekê, sê keçên xwe bi çekê kuştin. Li gorî gotina mafnasan îdamên li ber çavê giştî û herweha arîşeyên civakî û abûrî ji sedemên bûyerên bi vî awayî ne.**



Zêdebûna tundûtujî û kuştinên bi silahên germ di Îranê de bûye cihê nîgeraniyê û ewqas zêde bûye ku li gorî rapora salane a polîsan, rêjeya wan kuştinan gihîştiye 16% 'ê. Di rapora salane bas hatiye kirin ku di sala 1388'an de, 517 kuştinên bi çekên gerim hatine tomar kirin, lê di sala 1389'an, ew rêje gihîştiye 603 bûyerên kuştinê.

## Xema Wanê
## xema me ye









www.arsivakurd.org